Newroz Hejmar (70) Rûpel (8) Çirya Pêşîn 2006z – 2618k

Ragiyandina cîhanî ya mafên mirovan

Li 10î Çiriya pêşîn 1948 an , komela tevane ya Miletên Yekgirtî , ragiyandina cîhanî ya mafên mirovan ji xwe re wek belge biryar pê da û derxist . Tevaya deqa ragiyandinê, wê di pelên bê de were . Piştî wê bûyera dîrokî , komela tevane, ji hemî dewletên endam daxwazkir ku , doza deqa ragiyandinê bikin û ji belavkirin , derxistin , xwendin û şirovekirina wê re , bi taybetî di dibistan , amojgeh û hemî navendên fêrkirinê yên dî de kar bikin. Bêyî ku , cudatî, di navêna tu welat û navçeyan de, çi çûk an mezin hebe be .

Pêşgotin :

- Di dema ku , lixwenandin û bawerî bi rûmeta tevaya endamên malbata mirovatiyê û bi wekheviya mafên wan yên neguhêrbar , ew bingeha azadî , dadmendî û aştiyê di cîhanê de ye . Jibîrkirina mafên mirovan hîşt ku , pir karên qirêj û hovane ku , ziyan gihandî wijdana mirovahiyê bibin . Û armanca tevaya mirovan ew bû ku , avakirina cîhanekê , tê de azadiya gotinê û ayîna herkesekî parastî be , û ji tirs û birçîbûnê azad be . Û di dema ku, girîng bû ku , zagon parastina mafên mirovan bike , da ku mirov li dawiyê neçarnebe ku , li dij zulim û zorê serî hilde.Ji nû ve, miletên yekgirtî di belgeya mafên mirovan de, ayîna xwe bi mafên mirovan yên bingehîn , rûmeta kesan û wekheviya mafên jin û mêran tekûz û mêlag kirin û biryara xwe dan , ku koletiya civakî rakin û sewiya jiyana xelkê di heyameke azad û fere de , bilindbikin .Û dewletên endam jî soz dan , ku bi miletên Yekgirtî re alîkariya parastina mafên mirovan û azadiyên bingehîn bikin û rêza wê bigirin . Û dema ku , ji têghiştina van maf û azadiyan re , girîngiyek mezin bo bicihanîna vê soz û peymanê heye , wêlomê komela tevane bi vê ragiyandina Cîhanî ya mafên mirovan bang dike û dibîne ku, tiştekî hevpişke , gereke hemî gel û miletên cîhanê ji xwe re bikin armanc , ta ku , herkes û komîtak di civakê de, vê ragiyandinê bi ber çavên xwe de , û rêza wan maf û azadiyan di xwe de , di riya hînkirin , perwerdekirin û standina biryaran de , çi netewî an cîhanî biçîne. Heya ku , bendên di vê belgeyê de , li hemî deverên cîhanê parastî bimîne û binpê nebe .

Bend 1 :

Hemî mirov azad , û di rûmet û mafan de , wekhev dizên , û tev xwedî hiş û wijdan in. Û ji wan tê xwestin ku , bi giyaneke biratî bi hev re bidin û bistînin .

Bend 2 :

Ji mafê her mirovekî ye , bidesxistina van maf û azadiyên di vê ragiyandinê de hatine. Bê ku ,tu cudatî bi sedema nijad , reng , celeb , ziman , ol ,nêrîna rêzanî , an nêrîneke dî , an koka hemwelatî , civakî an jî çi rewşeke dî yan jî di navêna mêr û jinan de hebe . Bi ser tiştê hatî de , cudatiya ku , bingeha xwe , rewşa rêzanî , zagonî an navnetewî ya welatê ku , ew kes jê jî divê tune be . Çi ew welat û cîgeh serbixwe, bindest , bê otunumî an jî serdestiya wê bi awakî ji awan bendkirî be .

Bend 3 : **D.R.(10)**